CILÎ NEWROZ

Ciwan · B · Me'ruf
Nûsînewey be Latînî:
Salih Bêçar
Wêne : Sertîp Fetah

Çend rojêk ber le Newroz,Şwane û daykî çûne bazar bo kiřînî cilî cejin Daykî wîstî destê cilî Kurdîy bo bikřêt beľam Şwane qatêkî çaket û pantoľî heľbijard û witî : Dayke, minĥezim lem qateye û her emem ewêt.Daykî witî : Beserçaw emet bo dekřim beľam diľnîyam le cejinda peşîman debîtewe û deľêy xozge beqsey daykimim bikirdaye.

Cejnî newroz hat û Şwane cilekanî le berkird û çuwe derewe, beľam deçuwe her şwenê deybînî hemû xeľik be cilî Kurdîy rengaûřengewe aheng degêřin Şwane be bînînî em dîmene, hestî be peşîmanîyekî zor kird û ta cejin tewaw bû,her seyrî cilekanî xoy dekird û leberxoyewe deywit: Ĥeyfêkim beqsey daykim nekird,xozge beqsem bikirdaye.

X̆ غ	ř,Ř ڕ	v ڤ	J,j ژ	L,l ل	F,f ف	C ج	Ĥ,ĥ ح	H h ه	X خ	Ç چ	Î ئ،ی	m,M م	b , B ب	y,î ی	W,u و	
O ۆ	ş ش	s س	Q,q ق	L̈ Ï ڵ	N ن	g,G گ	A,a ئا،ا	ê,Ê ێ	K ک	r,R ر	eE ە	D,d د	Z ز	P پ	T,t ت	û,Û وو